

Tirkiye û çare-
seriya pirsê Kurd!

»»» R:7



Şikeşta
ewlehî

»»» R:2



Bideştveanîna mafên netewî yê gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (406) 23-09-2021 Buha (1000) Tûmen

Rastiya wekî
roja rohn

»»» R:6



Rewşa Sûriyê di
navbera Moskoyê û
Washingtonê de

»»» R:8



Êrîşa bombrêjkirî, xwekujiya siyasî ya rejîmê bû

Sibêdeha roja
Pêncşemî 18`ê Xe-
rmananê, ji demjimêr
6 sibêdehê ve rejîma
Komara Îslamî ya
Îranê bi hêceta hebûna
Hêza Pêşmergê Kurdis-
tanê êrîşa esmanî kire
ser navçeyên çiyayî ên
Başûrê Kurdistanê û
bo hemaya çend rojan
car caran lê berdewam
dom hebûye.

Gorî zaniyariyan,
rejîma Komara Îslamî
ya Îranê, êrîşek ber-
fireh kire ser çend
navçe ji Kurdistanê û
bi vî awayî ji balafirên
şerker û herwisa agirê
topxane û dronên
bombrêjkirî û balafirên
çavdêrî û sîxurî hewla
têkdana asayîşa Herê-
ma Başûrê Kurdistanê
da.

Berpîrsê Dezgeha
Fermendehî ya Hêza
Pêşmergê Kurdistanê
“Kawe Behramî”,
derheq wan êrîşên
rejîmê dabû xuya: “Di
encama wan êrîşan
de bi xweşî ve Hêza
Pêşmergê Kurdistanê
rastî ti zîyanek canî
nehatiye û ew êrîşane
tiştek nû nîne û berê
jî rejîma Îranê êrîşên
wiha kiriye”.

Cihê baskirinê ye ku
di dema êrîşa dronên
rejîmê de Hêza
Pêşmergê Kurdisatnê



kariye çend dronên bombrêjkirî bixe xwarê ku alavên wan di destê Hêza
Pêşmergê Kurdistanê de ye.

Êrîşên rejîmê ku heyama 5 rojan berdewam bû, guregura hin berpîrsên
leşkerî ên Spaha Pasdaran a terorîst hate gorê; Di 15`ê Xermananê de li de-
vedevê nêzîkbûna cinayeta 17`ê Xermananê, “Mihemed Pakpûr” Fermendê
Hêza Bejayî ya Spaha Pasdaran gef li hikûmeta Herêma Kurdistanê û hêzên
dijberê rejîma Îranê xwar ku bi zûtirîn dem bersiva wan dide û ragihandibû:
“Ku divê xelkê medenî û sivîl li derdorên binkeyên Hizbên Rojhilatê dûr
bikevin, da ku rastî xisaran neyên”. Her di wan çarçêveyan de çend ber-
pîrsêk din ên rejîmê hatine deng û şerê mediyayî ên nerim zêdetir kirin.

Piştî wan êrîşanane bertekên zêde li pey ve hatin. Berpîrsên navçeyî ên
hikûmeta Herêma Kurdistanê û xelkê sivîl ên Başûrê Kurdistanê hatine deng
û tevî şermezarkirina wê kiryara rejîmê ragihandin, “eva ku Komara Îslamî
encam dide tenê şer digel Hizbên Rojhilatî nîne, çimkî çi binkeyên wan ali-
yane di wan navçeyane de nîne, belkî hewlek bo têkdana jîngeha Kurdistan
û alozkirina aramiya navçe û çêkirina serêşe bo xelkê Kurdistanê ye”.

Ji aliyek din ve
hunermend, nivîser
û helbestvanên
Kurdistanê ew yeka
şermezar kirin. Herwi-
sa li diyasporayê jî li
ser daxwaza Navenda
Hevkarî xelkê Kurd-
istanê li dijî kiryarên
rejîmê li ber deriyê
balyozxaneya rejîmê
li çendîn welatan
xwenîşandan lidar xis-
tin û kiryarên terorîstî
ên rejîmê şermezar
kirin.

Di wê demê de ku
rejîmê bo veşartina
krîzên xwe ên navx-
weyî û jibîrbirina
neşiyani û bêhêziya
xwe li gelek warên
navxweyî û derveyî
de, êrîş kire ser Kurd-
istanê, lê gelempera
wan xalên ku hatine
baskirin carek din da
nîşandan, ku Kurd li
her cihek cihanê be
hevçarenivîs e û heta
vê dema ku Komara
Îslamî wek sereke-
tirîn dujminê Kurd
hebe kevir li ser ke-
vir nayê rawestandî,
lê di heman demê de
bo hemû aliyekê der
dikve eva ku rejîma
Tehranê dike, tenê
avêtina gulle di tarîti-
yê de ye û wek rêberê
me yê mezin dibêje:
“Di dîrokê de nehatiye
tomarkirin ku netew-
eyek bi zordariyê
hatibe helandin û ji
nav çûbe”.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî


Bi dronên xwe ên bombrêjkirî êrîş kirine ser çiya û bilindahiyên Kurdiştanê û jiyan û malên xelkê asayî kavi kirin, û wan agir berda pûş û dariştan û baxê deverê û bi bînîna agir xweşiya xwe nîşan dan ku wisa dizanin di pîlanên xwe de serkevtî bûne!

Roja 18'ê Xermananê, Spaha Pasdaran bi balafirên şerker û dronên bombrêjkirî û katiyûşa û tob êrîş kire ser Kurdiştanê. Hêceta Spaha Pasdaran eva bû ku Hêza Pêşmerge Kurdiştanê binkên xwe di wê navçeyê de çê kiriye û her wek Serokê Stada Hêzên rejîmê gotibû, ew nîgeranê kombûn û kongere û programên Hêza Pêşmerge Kurdiştanê bûn û lewam bi awayê berfireh û dije yasayî û serberedayî êrîş kirine ser axa welatek din.

Hêzên Spahê di demekê de li dora agirê dariştan xweşî dikirin û wisa dizanîn ku Kurdiştan kirine “xwelî şînk”, wan bixwe jî bi başî dizanin ku hêzên çekdar û çekên wan tenê bi xelkê asayî û sîvîl diwestin û ew tenê di meydana çol de bo vê yekê zîrek in ku ji Dêzful û Bûşehr û... bajarên din, bi doşka xelkê hejar bikin bi armanc. Ew di Kurdiştanê de dijî xortên Kurd ev zîrekatiye tininin û lewma bi balafirên bombrêjkirî çiya û nevalên Kurdiştanê dikin bi armanc.

Tevî çawahiya reftarên wan

Şikesta ewlehî



ên neşîyan û piropagendên bi bingeşên wan, du tişt ji pîlandarêjiya rejîma kolonyalîstiya Tehranê de gelek girîng bûn:

Yekem, bi ziman û ragihandinên xwe îtiraf bi vê yekê kirin ku di Spaha Pasdaran a terorîst de yekeya taybet bo dronên bombrêjkirî pêk aniye û ev yekeye jî ceribandine li ser Kurdiştanê û di wê pîlandarêjiyê de mifah ji dronên bombrêjkirî li dijî xelkê Kurdiştanê wergirtiye. Eva îtirafek resmî ye bi terorîstbûna rejîmê ku dibêje, dijî kesaneke ku ew bi dujmin dizane, ji kiryarên bombrêjkirî mifahê werdigre û ji dûr ve û bi bê vê ku encama vê bizane, kiryarên bombrêjkirî bi rê ve dibe.

Duyem, pîrsa girîng a ewlehî ye. Rejîmek ku bi salan e dehan milyar Dolar dahata welat ku diba bo avedanî û tendirustî û kar û jiyanê xelkê xerc kiriba, bo Spaha Pasdaran û girûpên terorîstî ên xwe xerc dike û bi dehan hezar hêzên serkutker û dehan hezar sîxur û demûdezgehên dûrûdirêj ên tirsê afirandine û sîxuriyê bi ser xelkê nav Îran û netewên Îranê de dike, lê pêka gotina xwedî berpirsên payebilind ên rejîmê û fermanên herî pilebilind ên leşkerî û Spah û hêzên çekdar, hebûna tîmek çend kesî ji Pêşmerge li Rojhilatê Kurdiştanê, tevahiya sîstem û demûdezgehên “Wîlayeta Fegîh” dixwe metirsiyê û ewlehiya wan ji wan vala dibe!

Ev mijare girînge bi îtirafa xwedî rejîmê nîşan dide ku her sîstemek dîktatorî ku herçiqas dirinde û pirçek be û heta eger çeka navkî jî li dijî xelkê xwe bikar bîne, heta çî aştêkê tirsinok e û bi silogana ciwanekê û bi geriyana tîmeke çend kesî ji pêşmerge tevahiya heybet û ewlehiya wê ya vala têk diçe û xewê li çavê rêberê wan û tev fermanê û berpirsên wan ên terorîstî aloz dike! Rejîm û sîstemek wiha, bi alxahîniyê ve di demeke ne gelek dûr de û bi hêsanîrîn şêwe diherife û ji nav diçe û serê fermanên leşkerî û berpirsên rejîmê bo pêlavê zarokên netewên Îranê tene tewandin.

PDKÎ: Piştî 29 sal bi ser terora “Mîkonos”ê de, hêj dezgeha teror a rejîma Îranê çalak e

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi hilkefta 29'emîn salvegera terora “Mîkonos”ê di daxuyaniyekê de belav kir, “ger em bixwazin waneyên Dr. “Qasimlo” di waneyeke kurt de bas bikin, ev jî eva ye ku bala me bo aliyê hêzên me ve rakêşaye û em tê gihandine ku ger me bawer bixwe hebe û piştî hev bigrin, dibine xwediyê şiyaneke mezin ku kela zaliman dihejîne û ber bi nemanê ve dibe.

Daxuyanî wiha ye:

Daxuyaniya Navenda Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi hilkefta 29'emîn salvegera terora “Mîkonos”ê

Gelên birûmet ên Îranê!

Xelkê azadîxwaz ên Kurdistanê

Kadr, pêşmerge û endamên têkoşer ên PDKÎ!

32 sal berî niha dema ku terorîstên rejîma Komara Îslamî ya Îranê li ser maseya binav danûstandinê Dr. “Qasimlo” teror kirin, Dr. “Sadiq Şerefkendî” bi zîrekati ve rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê girte stuyê xwe û alaya xebat li pêxema bideştveanîna armancên netewa me bilind ragirt.

Ev ku li dîbistana xwera-girî ya Demokrat de hatibû perwerdekirin, erkê xwe bi curekê lidar dixist ku bê “Qasimlo”yî bi Hizba Demokrat ve gelek bi kêmi xuya be, her eva jî wisa kir ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê bê ser vê bawerê bo carekê din û bi merema lawazkirina Hizba me pîlana terorkirina Dr. “Şerefkendî” darêje.

Li Sêptambra sala 1992'ê Dr. “Sadiq Şerefkendî” bi serpereştîkirina şandekê ku bi merema beşdarîkirin di 19'emîn kongereya “Înternasyonal Sosiyalîst” de çû Almaniyayê. Piştî bi dawîha-

tina karê Înternasyonal, bi merema civînkirin digel çend kesayetî ji opozîsyona Îranî li Almaniyayê li ser çawa rûbirûyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê bin, kom-bûnek li reştora “Mîkonos” a Berlînê rêk xistibû.

Li 26'ê Xermanana 1371'an a Rojî (17'ê Sêptambra 1992) di dema civînkirinê de, Dr. “Sadiq Şerefkendî” Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, “Fetah Ebdüyî” Endamê Komîteya Navendiya PDKÎ û Nûnerê Hizbê li derveyê welat, “Homayûn Erdelan” Nûnerê Hizbê li welatê Almaniyayê, “Nûrî Dêhkurdî” hevalê kevnar ê PDKÎ di wê reştora de raştî deştêrîjiya gulleyên terorîstên rejîma Komara Îslamî a Îranê hatin û hatine şehîdkirin.

Ev terore ji aliyê komîteyek bilind a rejîmê ya bi navê “Komîteya Operasiyona Taybet” (Komîtê Emeliyatê Wîjê) ku ji berpirsên payebilind ên rejîma Îranê pêk hatibû, bernamerêjî û biriyar li ser dabûn.

Endamên wê komîteyê pêk hatibûn ji:

1- Elî Xamineyî, Rêberê Nîzamê 2- Haşimî Refsencanî, Serkomar 3- Elî Ekber Wîlayetî, Wezîrê Derve 4- Elî Felahiyan, Wezîrê Îtîla'at û Farmandeyê Spaha Pasdaran a rejîma Komara Îslamî ya Îranê.

Dadgeha “Mîkonos” di 28'ê Oktobra 1993'ê de hate vekirin û li rêkevta 10'ê Aprîla 1997'ê hikma xwe derheq wê terore ragihand. Di wê hikmê de îşare bi bikerên wê terore hatibû kirin ku heman endamên “Komîteya Emeliyatê Wîjê” bûn. Piştî derçûna wê hikmê Ewropiyan gazî balyozên xwe li Îranê kirin û ew kiriyara terorîstî a wan şermazar kirin.

Rejîma Komara Îslamî ya Îranê ku li terora “Vîyen”ê de karîbû bi gef û danûstandina bazirganî digel dewleta “Otrîş”ê pêşiyê ji meşa dadgehîkirina dîplomat-terorîstên wê bigire, dixwaşt bi heman taktîk pêşiyê ji meşa dadgehîkirina Mîkonosê bigire û xwe û terorîstên xwe jê derbas bike, ku bi xweşî ve daxwaz û îradeya serbexweyîya dezgeha qezayî ya Almanê, bi ser gef û givaşên rejîma Komara Îslamî ya Îranê

de ser kevt û dadgehê erkê xwe ê yasayî bicih gihand.

Niha ku em yad û bîra 29'emîn salvegera terora “Mîkomos”ê dikin, dibînin dezgeha teror û serkuta rejîmê herweha çalak e û rejîma Komara Îslamî a Îranê di heyama çend mehên derbasbûyî de çend hewlên terorîstî li dijî xebtakerên rêya azadiyê li Başûrê Kurdistanê bi rê ve biriye ku nûterîna wan, terora “Mûsa Babaxanî” têkoşerê Demokrat bû.

Di nav cergê Ewropayê de jî çendîn pîlanên terorîstî ên rejîmê hatine pûçkirin û li çend welatên wek “Biljîk û Sûîd”ê jî terorîstên rejîma Komara Îslamî ya Îranê cezaya girîngê bi ser wan de hatiye sepandin.

Fermendê Hêza Bejayiya Spaha Pasdaran “Mihemed Pakpûr” û berpirsên din ên rejîmê bi bê vê ku ti rêûşûneke navnetewî liber çav bigirin, bi zordarî ve gefa berdewamîkirina topbaran û

»»» Dom R:4



»»»» Doma R:3

bombebaranê dîkin. Cîhana berjiwendîxwaz jî bo parastina berijwendiyên xwe, ji wan gef û yasabinpêkirinên Komara Îslamî ya Îranê de mêzeker û bêdeng in.

Di berdewamiya wê siyasetê de, rejîmê ji roja 18'ê Xermananê ve bi balafir û topxane ve êrîş kire ser binkeyên Hêza Pêşmerge Kurdistanê li çiyên Kurdistanê ku bi xweşî ve Hêza Pêşmerge Kurdistanê raştî ti ziyaneke canî nehat

Xelkê azadîxwaz ên Kurdistanê!


Di rêûresma alogora desthilatê de, “Îbrahîm Reîsî” Serkomarê diyarîkirî yê rejîmê ku diba ew kêmkurî û krîzên ku pêsîra welat girtine destnîşan kiriba û rêçareya derbasbûn ji wan pêşkêş kiriba, ti îşareyek bi wan nekir û rêkarek rohn bo çareserîya wan keîzan ku berhema siyasetên çewt ên rejîmê ne û Îran ber bi karesatê ve dibe, neanî ber bas.

Li cihê wê, “Reîsî” raşt hate ser kakilê wê mebesta ku wan bo destnîşan kiribû û ragihand ew “berevaniyê ji mîrata şoreşê dike û bernameyên xwe digel wê çarçêveyê diguncîne ku rêberê nîzamê mebesta wî ye”, eva jî bi wateya lihemberderketin li dijî her dengê narazî û berdewamîkirina siyasetên serkut û tundûtîjî û çalakkirina girûpên terorîstî ên wan û afirandina fitneyan di deverê de tê.

Hewwelatîyên rêzdar!

Rejîm ji hatina serkar ve bi merema şandina “Şoreş”ê bo derve dest avêtiye bi çêkirina girûpên terorîstî li deverê û hewildan bo bideştveanîna çeka navkî.

Ev siyaseta rejîmê bi gefek êşkere li dijî welatên deverê hate destpêkirin, her lewma cîhana azad dijî wan siyas-etane sekîrandiye û çend sal



e tehrîmên aborî ên navdewletî ên dijwar xîstîye ser Îranê ku xerca wan siyasetên fitnegerî, ku zêdetir li ser rejîmê be, pêsîra xelkê Îranê girtiye.

Bandora wan dorpêçên li ser Îranê, betalî û hejariya jiaşderketî bo xelkê li pey xwe aniye ku roj li pey roj xelkê ber bi hejartirbûnê ve dibe. Ew betaliye û hejariye dehan diyardeyên malvêrankirî ên civakî li pey xwe aniye û di encama wê rewşa xirab de nerizayetiya xelkê li pey wê ve hatiye û çavniheriya berfirehbûnê jî lê tê kirin.

Rejîm ku şiyana çareserkirina krîzan û ew rewşa xirab a aborî û civakî nîne, wek hertimî penaha xwe dibe ber serkut û givaş û dixwaze bi tirsandina xelkê çend heyamek din jî desthilata xwe ya serberedayî û tirsinok berdewam bike, lê wek Dr. “Şerefkendî” di peyama peymannûkirina piştî şehîdkirina Dr. “Qasimo” de dibêje: “Ji mêje ve gotine ku qebûlkirina zilmê ji xwedî zilmê xirabtir e, ger em bixwazin waneyên Dr. “Qasimlo” di waneyeke kurt de bas bikin, ev jî eva ye ku bala me bo aliyê hêzên me ve rakêşaye û em tê gihandine ku ger me bawer bixwe hebe û piştî hevdu bigrin, dibine xwediyê şiyaneke mezin ku kela zaliman dihejîne û ber bi nemanê ve dibe.

Di çarçêveya xîstinaserhev a wê vîze û şîyanê de ku rêberê me ê şehîd îşare pê kiriye, hewcehiya pêkanîna bere an hevpeymanîyek siyasî ji hemû demekê zêdetir tê hiskirin.

Hizba me amade ye û têkoşîn kiriye digel tev wan hêz û saziyên “Îranî” ku armanca wan herifandina Komara Îslamî ya Îranê ye û anîna serkar a rejîmek demokratîk e ku di vir de mafê netewên Îranê bê liberçavgirtin, diyalogê bike û hevpeymanî pêk bîne.

Rohn e yekgirtina Hizbên xebatkar ên Rojhilatê Kurdistanê li pêş hemû wan hewil û têkoşanan de ye, jiber ku yekgirtina hêzên siyasî ên Rojhilatê Kurdistanê mafên me li hember her egerek di paşerojê de tîne gorê.

Silav li şehîdên “Mîkonos”ê

Rûreşî û neman bo rejîma Komara Îslamî ya Îranê ya terorîst

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Navenda Siyasî

25'ê Xermanana 1400'an a Rojî

16'ê Îlona 2021'an

Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanê bi hilkefta 26`ê Xermananê peyamek belav kirin

Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanê, bi hilkefta 26`ê Xermananê, 29`mîn salvegera şehîdkirina Dr. “Sadiq Şerefkendî” û hevalên wî peyamek belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Xelkê azadîxwaz û gelên bi rûmet ên Îranê

Xwendekarên bi helwêst ên di nav çepera zaniştê de

29 sal berî niha li 26`ê Xermanana sala 1371`an a Rojî, ku tenê 3 sal bi ser terora Dr. “Ebdulrehman Qasmilo” re derbas bû, li restoranta “Mîkonos”ê li bajarê Berlîna paytexta welatê Alman û di nav dilê Ewropayê de Dr. “Sadiq Şerefkendî” Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê tevî sê kes ji hevalên wî yên bi navên “Fetah Ebdulî” “Endamê Komîteya Navendî “Humayûn Erdelan” Nûnerê Hizbê li welatê Alman û “Nûrî Dêhkurdî” xebatkarê naskirî yê Îranê û dostê Partiya Demokrat, bi deştê terorîstên Komara Îslamî ya Îranê hatine şehîdkirin.

Dr. “Sadiq Şerefkendî” rêber û kesayetiyê hilkevî û hişyar û xuya di nav tevgera rizgarîxweziya gelê Kurd û Partiya Demokrat, hilgirê komek taybetmendiyên bilind û berçav ên siyasî, civakî û nîştimanî, exlaqî, mirovî û xwediyê zanişt û zaniyarî bû.

Beşekî berçav ji jiyana Dr. Sadiq Şerefkendî li çepera xwendin û hînbûn û hînkirinê de derbas bû.

Xwendina despêkî û navendî li bajarê Mihabadê û dawî sala xwendina navendî li Tewrêzê dawî pê anî û li sala 1338`an a Rojî, li zanîngeha bilind a Tehranê lîsansa Şîmî wergirt. Cihê bas kirinê ye ku li hemû pileyên xwendinê de xwedî pileyên yekem û yek ji baştirîn xwendekar bû.

Her di wê salê de bû bi mamosteyê waneya Şîmî û heya sala 1344`an a Rojî li bajarên



wekî Mihabadê bi erkê xwe yê mamostayetiye mijûl bû, di vê heyamê de wekî mamostayekî şareza hatibû naskirin û piştî digel hejmarek mamostên din hevber û hevkar bo bajarên Erak û Kerec û çend bajarên din hatine dîrxistin.

Dr. “Sadiq Şerefkendî” sala 1349`an bo zaniştgeha “Terbiyet Mu`elim” hat veguhastin û wekî hevkarîkerê beşa Şîmî kar pê hate sipartin, piştî nîşandana şarezayek baş li karê xwe, sala 1351`an bi mifahwergirtin ji “Burs”a Wezareta Zaniştê çû bo welatê Feransa û piştî çar sal mana wî di wî welatê de karî duktoreya “Şîmî Analîz” li zaniştgeha hejmara 6 li Parîsê werbigre. Dr. “Sadiq Şerefkendî” sala 1355`an wegeriya Tehranê û wekî oştadyarê Şîmî li zaniştgeha “Terbiyet Mu`elim” dirêje bi karê xwe yê mamostatiyê da ku li bicîanîna wî erkê de jî bi tewawî serkevtî bû, ji ber vê bû bi xweştîyê mamosteyan û xwendekarên wê zanîngehê û wekî mamosteyekî dilsoz li heman demê de wekî kesek xebatgêr navê xwe der kir. Navbirî kesayetiyekî ferhengî

û mamostayekî şareza û pîspor bû, ku li despêka hatina wî bo Kurdistanê û beşdariya rastewxwe li tevgera Demokratîk a gelê Kurd û bi rêberiya Partiya Demokrat di warê nivîsinê de bo zaniyariyên zêdetir a teşkilata Hizbê deşt avêt bi nivîsinê û şiyana xwe da xuya.

Bi şehîdkirina Dr. “Sadiq Şerefkendî” ne tenê derbeyek giran li cêsteyê Partiya Demokrat kevt, belkî tevgera azadîxwazî li Kurdistan, Îran û deverê bi giştî rastî xisarekî mezin kir, çimkî Dr. “Sadiq Şerefkendî” şoreşgerekî azadîxwaz, bîrmendekî netirs û karbirêveberekî bi şiyana li meydana siyasî bû ku bê rawestan bi helwêste ve dijî her cure dîktatoriyek radiwesta heya ku di jiyana de bû, Partiya Demokrat û tevgera rewa ya wî bi hêz bû, û li dijî dagîrkerî disekînan û Komara Axûnid xistibû hejandinê.

29 sal piştî terora Dr. Sadiq Şerefkendî siyasî û dîtingeha Komara Îslamî li derheq pîrsa Kurd û netewên din ên Îranê neguherî ye û ew rejîme her wekî caran ji rêya serkut û teror û mûşekan ve

bersiva daxwazên rewa yên gelê Kurd daye.

Wekî Yeketiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistan, li 29`mîn salvegera karesata terorîstî a Mîkonosê tevî bilindragirtina yada şehîd Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî peymanê digel rê û rêbaza Dr. Şerefkendî û tevî şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê nû dîkin û em daxwazê ji civatgeha cîhanî dîkin ku li hember teror û kuştin û cinayeta rejîma Îranê û bi taybet êrîşên wan rojan bo ser Herêma Kurdistanê, ku bûye sedema têkdana jîngehê û têkdana ewlehî û tirsîna xelkê medenî û terora çalakvanên siyasî ên opozisyon, bêdeng nemîne.

Silav li şehîdên “Mîkonos”

Rûreşî û neman bo rejîma terorîst a Komara Îslamî ya Îranê

Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanê

26`ê Xermanana 2721`an

17`ê Îlona 2021`an

Rastiya wekî roja rohn



N: Nûredîn Sofîzade

Xebat û tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd li Rojhilatê kurdiştanê bi pêşengî û alahilgiriya 76 sale ya Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê bi bê rawestan diçe pêş û di wê xebatê de gelek nîrxên mezin hatine danê û rûbarê xwîna şoreşvanan ber çûye. Ew راستiya û hebûn û berdevamiya xebatê di Rojhilatê Kurdiştanê de û pêbendbûna kite Hizba Netewî- Demokratîk an ku PDKÎ di vê qadê de, bo hemî kes, dost û dijminan eyan e.

Di hemî derbasbûyîya wê xebata pi xwîn û dijwar de, di hemî serkevtin û pêşkevtinê di meydana de, di hemî berxwedanê û gernasîya Hêza Pêşmerge de, di hemî şikest û indahiyên mezine dijmin de, tu caran rejîmên yek li pey yek ên Îranê û dagîrkerên Kurdiştanê amade nebûne hebûna wê tevger û xebatê qebûl bikin û bînine ser zimanan.

Herwekî çavan înkara nasnama netewîya Kurdan dikin, herwekî çavan maf, ziman, çand û axa Kurdiştanê zevt kirine û îtirafê pê nakin, herwisa jî înkara hebûna tevgera rizgarîxwaziya me dikin û amade nebûne ku basê hebûna xebatê û hêzên pêşeng û siyasî ên di meydana de bikin.

Deshilatdarên rejîmê her piştî hatina ser kar a rejîma Xumeynî, cehda matkirina dengê mafxwaziya gelê Kurdan û bi êrîş û kuştara bi kom a xelkê Kurdiştanê û fermana cîhada li dijî Kurd û hilweşandî ragihandina PDKÎ, xwaştin dengê doza me mat bikin, û hekî nekarîn mat bikin jî, aliyê kêma bona xapandina xelkê navçên din



ên Îranê û cîhanê wisa bidine xuyakirin ku tiştê bi navê xebata Kurd nemaye û tu kesek nemaye ku dijberiya rejîma Îranê bike.

Rejîmê li wê pêxemê de û bona vê ku wê siyaseta xwe ya çepel bixe serê raya giştî, gelek caran amade nebû ku behsa şer û berxwedaniya Hêza Pêşmerge Kurdiştanê bike û di hindek ji wan şerane de hezaran kes ji hêzên rejîmê jî ger hatibana kuştin, tenê li ber vê yekê راستî nedigotin ku îdiayên wan yên direwîn ku digotin, “me xebata Kurdan tepeser kiriye”, eşkere nebe.

Di demekê de ku bi dirêjiya 43 sal temenê wê rejîma xwînmij, deshilatdarên wê berdevam basa ewlehbûna Kurdiştanê bo xwe kirine, û berdevam gotine; “ti hêzek siyasî nemaye”, berdevam gotine; “gelê Kurd tu daxwaz û nerizayetiyeke tunîne”, berdevam piropagende kirine ku karîne PDKÎ û aliyên din ên siyasî ji nav bibin û xebata wan rawestînin! Pirsyar eva ye, gelo çî tiştê bûye sedem ku ew heyamê çend rojane hemî berpîrsên siyasî-umnî û leşkerî ên rejîmê di asta herî bilind de, û di demûdezhêhen ragihandinan de û bi eşkere basa hebûn û çalakî û metirsîdarbûna hêzên Kurdî û Hêza Pêşmerge dikin û gefan dixwen û bi çekên giran û dronan û mûşekan kevtine agirbaran û êrîş bo ser axa Kurdiştanê û leşkerkêşiyê dikete ser Kurdiştanê?

Bi wan çend xalan em dikarî bersiva pirsîyara jorîn wergirin.

1 – Rejîmê di navxweyê Îranê de ti rewaiyîyek nemaye, bi metirsîdarnasandin, dujmin û cudayîxwaz nîşandana PDKÎ û şoreşa Kurd, cehda bizvandina heşt xelkê din ên Îranê dide da ku bikare carek dinê xelkê dora xwe kom bike û wê rewaiyîya jîdeştçûyî peyda bike.

2 – Rejîm ji tirsê nerizayetiya xelkê Îranê ku li ser herikîne ye û deshilatdarên rejîmê dizanin ku renga wê carê nekarin tepeser û mat bikin, bi êrîşa bo ser Kurdiştanê, dixwaze wisa bide xuya ku mijûlê şerkin digel dujmin û her nerizayetiyeke sûçdar dibe bi hevdeştî digel dujminê “Kurdiştan”ê û bi emniyetîkirina wê meselê dixwaze xelkê çavtirsandî bike.

3 – Rejîm dixwaze bi wan êrîşane bo ser Kurdiştanê û bi rojevîkirina şoreşa Kurd, yekrêziyê di nava deshilatdarên xwe de çê bike ku li ser dizî û gendeliyê û şerê deshilatê berbûne canê hevdu.

4 – Rejîm bi êrîşa ser Kurdiştanê cehdê dike ku lawazî û bêşiyaniya xwe veşêre û dixwaze hêza leşkerî û şiyana cebîlxaneyîya xwe bide xuya.

5 – Reşîm dixwaze wan şikestên xwe yên mezin û hezaran kuştîyên di Sûriye û Yemen û cîhên dinê de bi

êrîşa bo ser Kurdiştanê bi-peçêve.

6 – Rejîm dixwaze bêkîfayetiya xwe û rewşa xirab a aboriya welat, bi avêtina çend mûşek û dronan bo çiyayên Kurdiştan, wisa bide xuyakirin ku bûdce û dahata welat xercê şerê digel dujmin dike, û carek dinê dirûşma Xumeynî bêxine bîra xelkê ku “hemî tiştê bo şer”. Ew 6 xalên jorîn armancên sereke yên rejîmê ne, lê di راستî de mesele tenê ew nîne û ez wisa dizanim xalên herî sereke ev in ku rejîm hêj naxwaze راستiya bîne ziman.

1 – Berdevamiya xebata gelê Kurd û yekdeştiya netewî û hişyarî li ser maf û azadiyan li Kurdiştanê de, wekî netewa herî pêşeng û xwedî bandor li dijî rejîmê.

2 – Hebûna Hêza Pêşmerge Kurdiştanê û amadebûna berdevam di nav xelkê de.

3 – Rêkxistin û çekirina Pêşmerge Bajâr.

4 – Cehdên diplomatîk ên li astê derveyî welat de bona xistina rojevê ya pîrsa Kurd.

5 – Li astê seranserê Îranê de ti hêz û aliyek, ji bilî hêzên siyasî ên Kurd li hemberî rejîmê di meydana de nemane.

6 – Mîcidî û bigurtirbûna xebata hemî rehendî ya PDKÎ bi dijî rejîmê û pêşengîya wê Hizbê bona çekirina yekdengî û hevxeberiyê di navbera hêzên Kurdiştanê û seranserê Îranê jî, bi taybetî piştî ragihandina tevgera “Rasan”ê ji aliyê PDKÎ ve lerize xistiye kela deshilata rejîmê.

Belê bi berçavgirtina wan xalane bo me îsbat dibe ku armanca rejîmê ji wan gef û êrîşane çî ye.

Bê guman rejîm bi wan êrîşan ne tenê nagihîje armancên xwe, belkî dibe sedem ku hindî zêdetir gelê me yekgirtî û xebat bi gurtir be, pîrsa netewa me zêdetir di cîhanê de deng bide.

Nerîna Lîderan



“Joe Biden”:

“Heta Îran hemû xalên Bercamê bi rê ve nebe, em rêkvevtîna Bercamê nakin”.



“Îbrahîm Reîsî”:

“Me ti baweriyek bi gotinên Amerîkayê tinîne”.



“Mike Pompeo”:

“Xelkê Îranê ne dîktatoriya Şah dixwazin ne jî zordariya Olî”.



“Kemal Kiliçdaroglu”:

“Em dikarin bi HDPê re pirs Kurd çareser bikin”.

Tirkiye û çareseriya pirs Kurd!



N: Roştem Cehangîrî

Di rojên derbasbvûyî de ekterên bi bandor ên welatê Tirkiyê di peyvînên xwe yên cuda de hizr û ramanên xwe derheq çareserkirina pirs Kurd li Bakurê Kurdistanê bi awayekî eşkere anîn ziman. Kemal Kiliçdaroglo serokê mezintirîn partiya opozîsyona Tirkiyê naskirî bi CHP di paramentoyê de nerîna xwe sebareti pirs Kurd li vî welatî anî ziman û got: Em dikarin pirs Kurd di nava parlamentoyê de bi aliyên din ên yasayî re çareser bikin. Piştî ji Kiliçdaroglo hate pirs kirin, kîjan alî, aliyê yasayî yê Kurdan e? Navbirî di bersivê de ragihand: Partiya Demokrat a Gelan naskirî bi HDP, aliyê yasayî yê Kurdan e.

Kemal Kiliçdaroglo herwiha da zanîn ku eger em bibin desthilatdar, emê pirs Kurd çareser bikin. Me pirojeya xwe ya çareseriyê ji bo vî mijarê amade kiriye.

Heriwsa Ehmed Davudoglo serokwezîrê berê yê dewleta Tirk jî, da xuyakirin ku Kurd di wê devera me de emrê rastîn, wate tiştê e ku heye û nayê înkarkirin yan bi wat-eyeke din haşa jê nayê kirin. Dibe em qebûl bikin ku tiştê bi navê pirs Kurd li Tirkiyê û li welatên derdorên me heye û dibe bê çareserkirin û got jî ku me di pirogorama partiya xwe de jî aniye ku pirs Kurd li wir heye û me behsa Kurdan kiriye.

Ehmed davudoglo got: Eger em bêne ser kar, emê pirs Kurd çareser bikin, lê divê Partiya Karkerên Kurdistanê PKK çekan danî. Tekez jî kir ku roja çekdanîna wan, wê li Tirkiyê bibe roja aştiya netewî û wê tev alî bi hev re bi awayekî aştiyane bi-



jîn. Navbirî ragihand emê pêwendiya dewleta Tirk bi Kurdan re li her çar parçeyan asayî bikin û bikevin dostanîyê.

Herwisa wî ragihand ku pirs Sûriyê dikare bi damezrandina sîstema fedrasîyonê bê çareserkirin. Lê belê divê ji bo vî mebestê gelên Sûriyê bixwe biryarê bidin. Selaheddîn Demîrtaş siyaseştavnê girtî yê Kurd û hevserokê berê yê HDP jî di bersiva wan gotinan de li nav girtûgehê di peyamekê de xuya kir ku pirs Kurd dikare li nava parlamentoya Tirkiyê bi HDP re bê çareserkirin. Herwisa li ser vî mijarê jî çavdêrên siyasî li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê nêrînên xwe tînin ziman û dibêjin : Raşt e ku tê gotin ev tenê piropagendeyên berî hîbi-jartinên Tirkiyê ne lê ev ne raşt e û çavdêr dibêjin ev, piropagende nîn in. Lê belê aliyên siyasî li Tirkiyê gihane ser vî baweriyê ku divê pirs Kurd li Tirkiyê bi awayekî aştiyane û di riya diyalogê re bê çareserkirin. Tirk û Kurd dikarin bihev re welatê xwe pêş bixînin. Herwisa aramî û pêşketinê ji bo vî welatî diyarî bînin.

CHP wate partiya Kemal Ataturk ji destpêka avakirina dewleta Tirkiyê ve aştengiya herî mezin a li ser riya çareseriya pirs Kurd li Tirkiyê bûye! Wan hertim digot ku li Tirkiyê pirsê bi navê pirs Kurd tine ye. Lê tiştê ku ew niha dibêjin, ji xwe guhertinek mezin e ku di

hizr û nerînên vî partiyê de hatiye pêş.

Xuya ye ku Kemal Kiliçdaroglo ku bixwe jî xelkê Dêrsimê ye, gelek baş li mijarê haydar e. Wî tîlya xwe daniye ser birîna mezin û dibêje ez dermanê wê birîna kûr û kevnar nas dikim û emê wê çareser bikin.

Ji alî din ve çend rojan berî niha jî şandeke deshilatdar a partiya wan ku weke fraksyona CHP tê naskirin, serdana Başûrê Kurdistanê kir û bi rêveberên hikûmeta Herîma Kurdistanê re hevdi-tin çê kirin. Çend rojan li Herîma Kurdistanê man û serdana Kerkûkê jî kirin. Tiştê ku xuya ye, ev e ku di vî serdanê de ew gihiştine ser vî baweriyê ku li Herîma Kurdistanê hemû netewe û ol bi hev re dijîn û ji bo jiyana aştiyane, ti pirsîgîrek di navbera wan de nehtine pêş. Ger guhertinek di nêrîn û baweriyê wan de çê bibe, dikare çareseriyêke bîgehîn ji bo hemû pirsên vî deverê bi xwe re bîne û di encamê de jî aşti, aramî û bihevrejîyana aştiyane pêk bibe.

Niha top di qada HDP û PKK de ye. Em weke Kurd hevî dikin ku ew baş li ser mijarê bifikirin û wê derfetê baş binirxînin ku ji bo pêşeroja Tirkiyê girîng e. Eger ew herin qada danûstanê, dikarin careke din ji hevrikên xwe re bêtînin ku Kurd aştiyane in û evîndarên azadî û bihevrejîyana aştiyane û wekheviyê ne.

Rewşa Sûriyê di navbera Moskoyê û Washingtonê de



N: Ebdûlazîz Qasim

Tevî tekeziya hemû aliyên navdewletî li ser biriyara NY 2254 ji bo çareserkirina krîza Sûriyê, lê wekî xuya ye ku bêtê rêkeftineke Rûsî-Amerîkî, ti çareserî ji bo krîza Sûriyê nabe, ku niha li ser erdê hin xalên lihevkerinê diyar dibin, û bi kurtî dikarin nêzîkbûna di navbera Amerîka û Rûsiya de di sê xalên serekî de destnîşan bikin:

1- Razîbûna Amerîka li ser derbaskirina hêla gaz û enerjîyê bo Lubnanê di nava xaka Sûriyê re, ku ji bo gihandina gaza Misrê ji bo Lubnanê, li vê dawiyê civîneke hevbeş di navbera Wezîrên enerjîyê yên Urdun, Misir, Sûriye û Lubnanê de hat lidarxistin, herwiha ku ev yek bi razîbûna Benka Navdewletî jî hate encamdan û dûr nîne ku hin sizayên Amerîkî li ser Sûriyê bêne sekinandin. Li gorî hin çavkaniyên Amerîkî ku di civîna “Cenevre”yê de ya çend rojên borî di navbera berpirsê civata ewlehiya niştîmanî ya Amerîkayê, “Bertt McGurk” û Cîgirê Wezîrê Derve yê Rûsyayê “Sergei Ryabkov” û berpirsê Rûsya yê doseya Sûriyê, “Alexander Lavrentiev” de, ku “derbaskirina boriya gaza Misrê di nav axa Urdunê û Sûriyê de heta Lubnanê, û bicihanîna rêkeftinnameya 2018’an ya derbarê Der’ayê ji bo dûrkirina Îran û milîsên wê ji sînorê Îsraîlê, û rola Tirkîyê li bakurê Sûriyê, û herwiha çend dosyayên têkildarî” hatin gotûbêjkin. Li gorî heman çavkaniyan ku rolek mezin ya “McGurk” hebû li ser razîkirina Qahîreyê ji bo dirêjkirina boriya gazê heta Lubnanê, ji bo sivikkirina qeyrana sotemenî û elektrîkê ya Lubnanê.

2- Hewldanên Amerîkî -Rûsî



ji bo kêmkirina pêgeh û hejmongeriya aborî û bazirganî ya Îranê li ser Sûriyê, li gorî raporteka Rojnameya “Asharq Al-awsat”, ku di roja 20’ê meha Îlonê de hatibû weşandin, tê de hatibû ku di dema karantiya Korona de, bi qasî salekê, ji Adara 2020’an heta Adara 2021’an, ku çalakiyên bazirganî yên Îranê bi awayekî mezin li Sûriyê hatin rawestandî û bazirganiya Îranê di Sûriyê de bi qasî %43 kêmkirî, û ji aliyekî din, Cîgirê Serokê Odeya Bazirganiyê ya Sûrî-Îranî, “Elî Esxer Zibirdest”, danpêdan bi xisareta “Tehranê di pêşbaziya aborî ya bi Rûsyayê re li Sûriyê” kir, herwisa tevî derbên leşkerî yên Îsraîlê li ser serbazgehên Îranê di nav xaka Sûriyê de, zêdebarî hewldanên Erebi ji bo derxistina Îranê û Hizbulah ji Sûriyê, û hewldanên Îsraîl û Amerîka ji aliyekî din ji bo dûrkirina Îranê û milîsên wê ji sînorên Îsraîlê.

3- Çareserkirina pîrsa Kurdî û derxistina Tirkîyê:

Tevî astengiyên dikevin di pêşiya diyaloga Kurdî- Kurdî de, lê hêj Amerîka li ser hewldanên xwe berdewam e, û berî çend rojan hevdîtin ji aliyê Cîgirê Wezîrê Derve yê Amerîka digel aliyên Kurdî hatin lidarxistin, û ENKS ji aliyê xwe, li roja çarşemê

15’ê Îlonê di daxuyaniyekê de ragihand ku bi rêya programê “CCTV” civînek di navbera wê û Cîgirê Wezîrê Derve yê Amerîka “Joey Hood” û rayedarên dosyaya Sûriyê de hat lidarxistin, ji bo gotûbêjkirina çareseriya siyasî ji krîza Sûriyê re, û piştgiriya danûstandinên Kurdî-Kurdî. Û di daxuyaniyê de, hat ku “Hood” xuya kir ku welatî wî “piştgiriya dide danûstandinên di navbera ENKS û PYNK de”.

Li gorî raportek ku di malpera “Amejas” de li roja 20’ê Îlonê hat weşandin li ser zarê çavkaniyên nêzîkî PYNK, ku di rojên pêş de gereke nû ji denûstandinan wê di navbera wê û ENKSê de bi çavdêriya Amerîkî bi armanca gihîştina rêkeftinek berfireh destpê bike.

Moskow ji aliyê xwe ve di van rojên dawîn de, ji bo gotûbêjkirina rewşa Sûriyê, çend hevdîtin digel aliyên cuda lidar xistin, nemaze hevdîtina Serokê Rûsiya Pûtîn bi Serokê Sûriyê “Beşar Esed” re li Kremlînê, herwiha hevdîtina Nûnerê Taybet yê Serokê Rûsyayê li Rojhilata Navîn û Afrîkayê, Cîgirê Wezîrê Karên Derve “Mîxaîl Bogdanov”, li Moskowê bi Îlham Ehmed re seroka şandeya “Encûmena Sûriya Demokratîk” re, û

Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê di daxuyaniya xwe de got, ku “di hevdîtinê de, wan nêrînên xwe yên li ser rewşa Sûriyê, bi taybetî li ser rewşa bakur-rojhilatê welêt parvekirin”, li gorî daxuyaniyê, aliyê Rûsî “helwesta xwe li hember girîngiya domandîna diyalogê di navbera Encûmena Sûriya Demokratîk û Şamê de diyar kir.

Tevî civîna “Cenevre”yê ya çend rojên borî di navbera berpirsê civaka ewlehiya niştîmanî ya Amerîkayê, “Bertt McGurk” û Cîgirê Wezîrê Derve yê Rûsyayê “Sergei Ryabkov” û berpirsê Rûsya yê doseya Sûriyê, “Alexander Lavrentiev” de, li gorî çavkaniyan ku di civîna de gelek mijarên girîng li ser rewşa Sûriyê bi giştî û rewşa navçeyên Kurdî hatibûn gotûbêjkin, nemaze ku “McGurk” li dijî dagîrkariya Tirkîyê li ser Efrîn û Serêkaniyê helwestên tund standim û dixwaze hevkarîyê ligel Rûsiya bike ji bo derxistina Tirkîyê ji Sûriyê, û herwiha ew Kurdan han dide ber bi diyalogê li gel rejîma Şamê û Rûsyayê. Herwiha tê gotin ku di heftiya bê de, dê çend hevdîtinên girîng li ser krîza Sûriyê û di nav de li ser pîrsa Kurdî bi beşdariya nûnerên kurd li Washington wê bêne lidar xistin.

Du welatî li bajarên Şino û Seqizê hatine binçavkirin


Roja Yekşemî 28`ê Xermananê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Hesen Qudretî”, temen 45 salî, kurê Hacî Xizir û rûniştîyê bajarê Şinoyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin.

Hêzên ewlehî ew welatiye bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî binçavkirine û piştîre bo lêpîrsînê, bo yek ji girtîgehên ewlehî li bajarê Urmîyê veguhaştine.

“Hesen Qudretî”, xîzandar û xwediyê 5 zarokan e.

Ji aliyê din ve, roja Şemî 27`ê Xermananê, welatiyek ê bi navê “Xerîb Şerîfzade”, xelkê bajarê Seqizê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo cihekî nexuya hate veguhaştin.

Hêzên ewlehî ew welatiye bi



bê hebûna ti belgeyekî yasayî binçavkirine û di dema binçavkirinê de navbirî kutane û îşkence kirine.

“Xerîb Şerîfzade”, di sala 1396`an de jî bi tohmata “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberî hikûmeta Îranê”, bi 2 sal girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan û heyama cezaya xwe li girtîgeha bajarê Seqizê derbaskiribû.

Heya dema belavbûna wê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wan du welatiyan de hatine sepandin ti zanyariyek li ber deşt nîne.

Kuştina 4 kolberan di heyama kêmtir ji du heftiyan de

Hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê di heyama kêmtir ji du heftiyên derbasbûyî de li ser sînorên Merîwan, Bane û Serdeşt, 4 kolberên Kurd kirine amanca teqeyên xwe yên raşterast û kuştine.

Herwisa bilî wan 4 haletane, kolberekî Kurd yê din ê bi navê “Şoket Qurbanî”, kurê Êvez û xelkê gundê “Dizawer” ê ser bi bajarê Nodşeyê, di dema kolberiyê de bi sedema sekinîna dil, canê xwe ji deşt daye. ew kolbere raştî hêzên leşkerî yên hikûmetê hatiye û bi sedema tirsê, tûşî sekinîna dil bûye û canê xwe ji deşt daye.

Di piraniya haletan de, hêzên leşkerî yên hikûmetê bi bê agehdarkirina berê teqeyên raşterast li kolberan dikin û bê guman dikarin bêjin ku teqeya raşterast a wan hêzan bi awayekê ye ku dêxine stûyê yekî din û di haletên wekî teqeya raşterast a kolberekî bi navê “Mihemedemîn Qadirî” ku teqe li dilê wî hatibû kirin, hate kuştin û bikirên wan teqe û qetilane, ji aliyê hikûmetê ve piştivaniya

qezayî jê tê kirin.

Roja Çarşemî 17`ê Xermananê, kolberekî Kurd ê bi navê “Sîrwan Gulzarî” xelkê gundê “Ceşnîava” yê girêdayê bajarê Merîwanê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê ji bilindahiya sînorê wî bajarî canê xwe ji deşt da.

Şeva Yekşemî 21`ê Xermananê, kolberekî Kurd yê bi navê “Resûl Kerîmî”, kurê Kerîm û xelkê bajarê Banê, li encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê wî bajarî, canê xwe ji deşt da.

Roja Pêncşemî 25`ê Xermananê, kolberekî kurd ê bi navê “Mihemedemîn Qadirî, kurê Salih û xelkê Baneyê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li sînorê “Meran”ê yê wî bajarî, canê xwe ji deşt da.

Şeva 27`ê Xermananê, kolberek bi navê “Umîd Mihemedzade”, temen 39 salî, xelkê gundê “Girwês” û rûniştîyê bajarê Rebetê li encama teqeya hêzên leşkerî



yên hikûmetê li ser sînorê bajarê Serdeştê canê xwe ji deşt da.

Pêka amarên tomarkirî ku li navenda Amara Saziya Mafê Mirov a “Kurdpa”yê gihîştîye deşt, li meha Gelawêja îsal, 24 kolberên Kurd hatine kuştin û birîndarbûne (2 kuştî û 22 birîndar).

Herwisa pêka amara 10 sale ya “Kurdpa”yê li derheq kuştina kolberan di Kurdiştanê de, li deşt pêka sala 1390`an heta dawîya sala 1399`an a Rojî, bi giştî 1506 kolber di Kurdiştanê de, hatine kuştin û birîndarkirin.

Kuşî: 515 halet
Birîndar: 986 halet
Bêserûşûn: 5 halet

Mihemed Arif Cizîrî bilbilê çiyayê Botan û Badînan

N:Keyhan Mihemedînijad

Cizîra Botan yek ji bajarê kevnar ê Bakurê Kurdistanê ye ku di wî bajarî de gelek mîr, egîd û hunermendên navdar hilkevîne.

Bajarek ku malbata Bedirxaniyan şariştaniyeta moderin, netewîbûn û nîştimanperwerî anî tê de. Her di wî bajarê kevnar de, hunermendek navdar ê gelê Kurd hildikeve ku ev jî “Mihemed Arif Cizîrî” yan jî “Cizrawî” bû.

“Mihemed Arif Cizîrî” di sala 1912’an de li bajarê Cizîra Botan hatiye dinê. Mihemed Arif di demekê de ji dayîk dibe ku hevçax bûye digel şerê cihanî yê yekê û qirkirin û kuştina bi kom a Ermeniyan ji aliyê Împiratoriya Osmanî ve. Bavê Mihemed Arif jî bi zorê mîna gelek Kurdan bo şerê cihanê yê yekê hatiye şandin, êdî ew venegeriyaye û heta niha jî cihê wî hêj nediyar e. Ew yeka bo Mihemed Arifê piçûk pir nexweş bûye û ew bi sêvîti mezin dibe.

Mihemed Arif Cizîrî wek tev zarokên Cizîra Botanê, ji bav û kalên xwe, hînê çîroka Memê Alan û serboriyên Mîr Bedirxan û kurên wî bûye. Mihemed Arif Cizîrî bixwe kesek netewî bû û bi heştên netewî mezin dibe. Piştî têkçûna deşthilata Osmanîyan û hatina ser kar a Komara Tirkîyê bi serokayetiya Mîstefa Kemal, û deştêpêkirina serhildana 1925’an bi serokayetiya Şêx Seîd Pîran û piştî midehekê ku ew serhildan jî hate temirandin û îdmakirina serokên wê serhildanê û herwisa girtina bîkom a welatîyên Kurd ji aliyê hêzên Kemalîstan ve, yek ji wan xortan jî ku hate girtin û kevtê girtîgeha Diyarbekirê, “Mihemed Arif Cizîrî” bû. Ew wê demê ku hate girtin tenê 13 sal temen hebû. Wê demê gelek xortên Kurdan li ber çavên Mihemed Arif hatine îdamkirin. Lê bi sedema piçûkbûna wî li sala 1929’an ber efûyê kevt û hate berdan.

Ev wê demê xortek 17 salî bû.

Êdî hizrên wî têne guherîn û hisa wî ya neteweperweriyê çend hember zêdetir dibe. Dema ku ew ji girtîgehê tê berdan çend mehekê kedkariyê dike. Di hemem demê da jî deşt bi gotina ştranan dike, ew mehta gernasana dike û di heman demê de jî xirabiya kesên xwînmij û sitemkar eşkere dike.

Di wê demê de ku gelek mîrxas û xortên Kurdan ji aliyê hêzên dagîrker ve dihatine azar û îşkencedan, Mihemed Arif dikir bi helbest û dianî ser ziman.

Dayîka Mihemed Arif dengbêjek navdar a Cizîra Botanê bû, ew her ji zarotiyê ve Mihemed Arifê kurê xwe hînê ştran û dengbêjiyê dikir. Mihemed Arif zêdetir li ser şopa diya xwe bû û di dawet û şahîyan de li cem diya xwe ştran distriyandin û wî mîfahên baş li diya xwe werdigirt.

Ew her zû kevtê nav dilê evîndarê xwe û wî kul û derdê civatgeha xwe dianî ziman û her lewma xelkê deverê pir jê hez dikirin. Jiyana Mihemed Arif Cizîrî wê demê bi sedema givaşên hikûmeta Tirkîyê li ser xelkê û bi taybet li ser wî gelek baş nebû, êdî ew bi neçarî ve li deştêpêka sala 1930’an berê xwe dide Başûrê Kurdistanê û li bajarê Zaxo bi cih dibe û li wir deşt bi hunermendiyê dike. Wê demê bajarê Duhokê jî yek ji wan bajaran bû ku hunera Kurdî tede zêde geşe dikir. Ew diçe Duhokê û li wî bajarî karê hunerî dike û ştrana dibêje. Wî hevdem bi gotina ştranan kar jî dikir û di dawiyê de wî li bajarê Duhokê xwaringehê vekir. Wî bi roj di xwaringehê de kar dikir û bi şevan jî li cem heval û dostên xwe ştran digot.

Wî ji bo pêşxistina çanda Kurdî ya hewce ba dikir, ew gund bi gund digeriya û ştran digot, ew her roj hînê peyvên



nû yên Kurdî dibû û di nav ştranan xwe de wêjeya Kurd zêdetir dewlemend dikir. Ew di sala 1947’an de, ber bi bajarê Baxdêyê ve diçe û li wir jî di Radyoya Bexdayê de karê hunerî dike û ew di wir nêzî 350 ştranan tomar dike.

Mihemed Arif di radyoya Bexdayê de, bi Almas Xan, Hesên Zîrek, Tahir Tûfîq, Nesrîn Şêrwan, Îsa Berwarî, Eyşe Şan, Meryem Xan û Elî Merdan re dikeve têkiliyê. Radyoya Bexdayê qonaxek nû ji jiyana Mihemed Arif bû û navê Mihemed Arifê Cizîrî li tev Kurdistanê belav dibe. Di nav ştranan Mihemed Arif Cizîrî de folklor û gelerî, evîndarî û şerê egîd û mîrxasan, camêrî û dîroka Kurdan tê bihiştin.

Di wê demê de ku zimanê Kurdî ji aliyê dagîrkeran ve hatibû qedexekirin, wî gotinên Kurdî yên resen peyda dikir û ew gotin di tûrêkê xwe de diparast û tovê wê di nav gel de direşand. Mihemed Arif di sala 1973an de, bi Gulbahar û Îsa Berwarî re diçe Lubnanê û li wir dibe mêvanê Seîd Yûsîfî û di konseran de ştranan dibêjin. Mihemed Arif Cizîrî bilbilê

çiyayê Botan û Badînan bû. bi saya wî gelek ştranan Kurdî ji wundabûnê hatin paraştin û gelek Kurdên ştranebêj jî dane ser şopa wî. Dengê Mihemed Arifî ne tenê di Kurdistanê de, belkî di gelek welatên din de jî hatiye bihiştin.

Pêka hin çavkaniyan Mihemed Arif Cizîrî 100an ştran û 60 kasê tomar kirine. Beşek ji ştrane wî jî ev in: Xezal, Xirabo, Swaro, Pismamo, Yardilo, Ez Xezal im, Bêrîvanê, Befr barî, Babê Fexrê, hesênîko, Çiyayê Şengalê, Koçerê, Gulê Mehromê, Şevên Nîsana, Diyarbekir, Çiyayê Kurdistanê û hwd.

Mihemed Arif Cizîrî di sala 1979an de diçe Hecê. Dema ku ew ji hecê dizivire her dîsan dev ji tembûr û hunera xwe bernade. ew di van salan de, bi Eyşe Şanê re diçe Duhokê û bi hev re gelek ştrana tomar dîkin. Di 17-12-1986an li bajrê Duhokê diçe ser dîlovanîya Xwedê û wî ji hunera Kurdî malavayî kir û li gorîstana Şaxkê bi axê hate spartin. Lê nav û dengê wî ti carî nayê jibîrkirin û hertimî di nav dilê evîndarê xwe de ye.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Çendîn kolberên xelkê Urmiyê hatine kuştin û binçavkirin

Pêka nûçeya ku gihîştîye bi “Kurdiştanmedia”yê, çendîn kolberên xelkê gundê “Koran” ê ser bi devera Soma û biradoşt a ser bi Urmiyê, raştî boşeya hêzên Artêşa Tirkîyê hatine û di encamê de du kolber hatine kuştin û 8 kolber jî hatine binçav kirin.

Çavkaniyekê nasnameya wan du kolberane wiha bi “Kurdiştanmedia”yê re daye zanîn, “Sozdar û Elîşan Ehmedî”. Ev sibêdeha duşemî kevtine boşeya Artêşa Tirkîyê û bi gulleyên raşterast ên hêzên Tirkîyê canê xwe ji deşt dane.

Heta niha zêdetir ji deh kolberên xelkê gundê Koranê ji aliyê hêzên rejîma Îran û Tirkîyê ve hatine kuştin û birîndarkirin.

Welatiyek li encama teqeya hêzên leşkerî canê xwe ji deşt da

Roja Înê 26`ê Xermananê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Mihemed Birûkî”, temen 26 salî, kurê Mecîd û xelkê gundê “Cigen” ê ser bi bajarê Makûyê, li encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê canê xwe ji deşt da.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, “Mihemed Birûkî” li encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê bi awayekî dijwar hatibû birîndarkirin û di encamê de canê xwe ji deşt da.

Herwisa wê çavkaniyê da zanîn ku hêzên leşkerî yên hikûmetê bi gumana hilgirtina kel û pelên qaçax, bi bê agehdarkirina berê teqe ji maşîna wî welatiyê kirine.

Herwisa di wê peywendiyê de şeva 27`ê Xermananê, kolberek bi navê “Umîd Mihemedzade”, temen 39 salî, xelkê gundê “Girwês” û rûniştîyê bajarê Rebetê li encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê bajarê Serdeştê canê xwe ji deşt da.



Kolberekî xelkê bajarê Nodşeyê canê xwe ji deşt da

Şeva Înê 26`ê Xermananê, kolberekî Kurd ê bi navê “Şoket Qurbanî”, kurê Êvez û xelkê gundê “Dizawer” ê ser bi bajarê Nodşeyê, di dema kolberiyê de bi sedema sekinîna dil, canê xwe ji deşt daye.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew kolbere raştî hêzên leşkerî yên hikûmetê hatiye û bi sedema tirsê, tûşî sekinîna dil bûye û canê xwe ji deşt daye.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Hêzên leşkerî rêgirî ji alîkarîkirina pirsonêlên orjansê bo tedawiya pizîşkiya “Şoket Qurbanî” kirine. Wê çavkaniyê herwisa da zanîn ku ew kolber di encam de piştî çend demjimêran bi bê tedawiya pizîşkî canê xwe ji deşt daye. “Şoket Qurbanî” xîzandar û xwediyê sê zaroka ne.

Ramîn Ramîn bo girtîgeha bajarê Mihabadê hate veguhaştin

Di heyama Çend rojên derbasbûyî de, welatiyekî Kurd ê bi navê “Ramîn Ramîn”, xelkê gundê “Qarnê” yê ser bi bajarê Nexedeyê, piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsîna wî li yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmiyê, bo girtîgeha bajarê Mihabadê hatiye veguhaştin.

Ew welatiye di heyama binçavkirinê de, ji “mafê hebûna parêzer” û “hevdîtin digel malbata xwe” bêpar bûye. Ramîn roja Çarşemî 10`ê Xermananê, tevî 4 welatiyên din ên bi navên “Es`ed Ramîn, Xalid Ramîn, Dawûd Rehîmî û Serdar Ramîn” , bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wî welatiyî de hatiye sepandin ti zaniyariyek ji ber deşt de nîne.


Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (406)



Dr. Sadiq Şerefkendi

***Rêberek wek navê xwe sadiq û rastbêj
Rêberek dilsoj û wefadarê rêbaza şehîdan***